CEGERXWÎN



Keyo Cegerxwîn

Bi navê Şêxmûs ji dê û bavekî gundî-cotkar-belengaz di sala 1903de li gundê HESARÊ li Bakurê Kurdistanê hatiye cihanê, ji (11) xûşk û bira tenê sisê mane: Şêxmûs, Xelîl, Asya.

Di sala 1918de bavê wî HESEN li bajarê AMÛDÊ serê xwe danî û çûye ser heqiya xwe.

Di sala 1919de li gundê BÊDIR-MEMO diya wî Eyşan ya heftê salî jî serê xwe danî û çûye ser heqiya xwe.

CEGERXWÎN pêlak ê li cem xûşka xwe û birayê xwe maye.

Di sala 1920de çûye xwendegeha olperestî û çend salan li ser hev li Kurdistana Sûriya, Îraq û Îranê jî li xwendinê geriyaye û rewşa gelê Kurdistanê baş nas kiriye.

Di sala 1927de keça xalê xwe Kehla Selîm ji gundê Hesarê ji xwe re aniye û li Amûdê bicî dibin.

Di sala 1928 de xwendina xwe qedand û îcaza xwe wergirt û bû melayê gundê Hazda jorî û di wê salê de dîwana xwe ya yekemîn nivîsiye, ev dîwan e winda bûbû û berî 3ê salan ketiye destê me û heta îro nehatiye çapkirin.

Di sala 1936de bi çend malê gundî ve du gund li jêrê avaniyê avakirin(Çêlek û Cehenem).

Di sala 1937-1938 de Cegerxwîn û hevalên xwe Nadiyek-Komelek li bajarê Amûdê ji xortên Kurd re vekirin û komela wan gelek berepêş çû, lê bi navtêdana hin mirovên nezan û dijminê miletê Kurd Firansizan komela wan girt.

Di sala 1946 de Cegerxwîn mala xwe ji gund guhaztiye bajarê Qamişlo û ketiye nav pêlên rêzanî û siyasetê û di wê salê de Civata Azadî û Yekîtiya Kurd hate çêkirin: Dr.Ehmed Nafiz serok û Cegerxwîn sekretêr...

Di sala 1948de Cegerxwîn bûye hevalê Partiya Komonîsta Sûriya.

Di sala 1949de cara yekemîn bû ku Cegerxwîn hatiye girtin.

Di sala 1950de Cegerxwîn dikeve civata Aştîxwazên Sûriya û bi wan re kar dike.

Di sala 1954de Cegerxwîn pêşkêşî perlemana Sûriya bû ji aliyê Komonîstan ve.

Di sala 1957 de Cegerxwîn ji komonîstan dûr dikeve û di wê salê de Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina AZADÎ sazdikin û piştî pêlakê Cegerxwîn û hevalên xwe rêxistina xwe fesix dikin û bi Partiya Dîmokratî Kurdî re dibin yek.

Di sala 1959 de Cegerxwîn direve Îraqê û sê salan li wir dibe mamosteyê zimanê Kurmancî li Zanîngeha Bexdayê-perçê Kurdî û dersên Kurmancî dide xortên Kurd.

Di sala1962de hukûmeta Îraqê bera Cegerxwîn dide û ew û zarokên xwe vedigerin Sûriya, Cegerxwîn diêt girtin û piştî pêlakê diêt berdan.

Di sala 1963 de dîsa Cegerxwîn diêt girtin û dikeve Zindana Mezê li bajarê şamê, lê piştî pêlakê diêt berdan lê wî nefî dikin û dişînin bajarê Siweyda nav Durziyan, lê piştî pêlak e nedirêj diêt berdan û vedigere bajarê Qamişlo.

Di sala 1965 de Cegerxwîn dibe endamê komîta merkezî ya partiya Dîmokrat ya Pêşverû ya Kurd li Sûrya û heta dawiya jiyana xwe jî endamê merkeziya partiya xwe dimîne.

Di sala 1969de Cegerxwîn diçe Kurdistana Îraqê nav şorişa Kurdî û nêzîkî salekê li wir dimîne û li wir dîroka şorişê dinivisîne (1969) lê mixabin ku ew dîrok winda bûye û

em nizanin li kû maye.

Di sala 1970de Cegerxwîn ji Kurdistana Îraqê vedigere Sûriya.

Di sala 1973de Cegerxwîn direve Libnanê û li Beyrûtê bi cî dibe û dîwana xwe ya sisiyan KÎME EZ? û Salar û Mîdya li wir çap dike. Di sala 1976de Cegerxwîn vedigere Sûriya û heta sala 1979an li wir dimîne.Di (3/8-1979de Cegerxwîn ji Sûriya direve û diçe Siwêd û pênc salên xwe yên dawî ji jiyana xwe li Siwêd derbas dike.

Di 22-10-1984de li bajarê Stockholmê-Swêd Cegerxwîn serê xwe danî û çûye ser heqiya xwe.

CEGERXWÎN di hewşa xaniyê xwe de li bajarê Qamişlo hatiye veşartin.

Ji bo zanîn:

Zarokên wî ên ku li dû xwe hiştine du kur û pênc keç in: Sînem (çûye ser heqiya xwe, Keyo, Gulperî, Rojîn, Beniye, Azad, Selam.

Neviyên wî 26 kes in.

Mixabin ku di JÎNENÎGARIYA Cegerxwîn de salên 1969, 1973, 1976 ne hatine nivîsandin û pir diriste ku bavê min ji bîr kirine.

Berhemên Cegerxwîn yên çapkirî

1- Dîwana yekem: Prîsk û Pêtî, 1945 şam

2- Cîm û Gulperî, çîroka yekem,1948 şam

3- Dîwana diwem: Sewra Azadî, 1954 şam

4- Reşoyê Darê, çîroka diwem , 1956 şam, Stockholm

5- Tarîxa Kurdistan -1, Weşanên Roja Nû 1985 Stockholm

6- Tarîxa Kurdistan -2, Weşanên Roja Nû 1987 Stockholm

7- Folklora Kurdî,

8- Gotinên Pêşiyan, 1957 şam

9- Destûra Zimanê Kurdî, 1961 Bexda

10- Ferheng, perçê yekem,1962 Bexda

11- Ferheng, perçê diwem,1962 Bexda

12- Dîwana siyem: Kî me Ez?1973 Beyrût

13- Salar û Mîdya, 1973 Beyrût

14- Dîwana çara: Ronak, Weşanên Roja Nû 1980 Stockholm

15- Dîwana pênca: Zend-Avêsta, Weşanên Roja Nû1981 Stockholm

16- Dîwana şeşa: şefeq, Weşanên Roja Nû 1982 Stockholm

17- Dîwana hefta: Hêvî, Weşanên Roja Nû 1983 Stockholm

18- Dîwana heşta: Aşitî, Weşanxana Kurdistan 1985 Roja Nû 1988 Stockholm

19- Jînenegariya min, Weşanên Apec 1995 Stockholm

20- Nivîsarek li ser dîbaca Ehmedê Xanî, Weşanên Apec 1995

21- Tarîxa Kurdistan -3, Weşanên Roja Nû 1999 Stockholm

22- Şerefnameya menzûm. Şerefxanê Bedlîsî-çapxana Emîral-



Beyrûd 1997- ji tîpên erebî hatiye wergerandin tîpên Kurdî- werger Dîlawer Zengî.

Berhemên Cegerxwîn yên ko hatine wergerandin bi zimanê erebî.

1- Tarîxa Kurdistan1, werger Xalis Mesûr, çapxaneya Emîral-Beyrût 1/7-1996.

2- Reşoyê Darê- çapxaneya Al-sebah 1986 werger Tewfîq Al-Huseynî.

3-Jînenegariya min,werger:Ciwan Eyo û Dîlan şewqî, çapxaneya Dar bafet lilneşir weltibae 2001.

4- Tarîxa Kurdistan 2, werger Xalis Mesûr, çapxaneya

2003

Berhemên Cegerxwîn yên ne çapkirî nêzîkî 30 pirtûkî hene.

NIVIŞTÊN CEGERXWÎN YÊN NE ÇAPKIRÎ

1- Dîwana Seydayê Cizîrî (şerih)

2- Dîwana Seydayê Ehmedê Xanî (şerih)

3- Çend şorişên Kurdên kevnar

4- Destûra Kurdistanê (şiir)

5- Awa û destûra zimanê Kurdî (Grmatik) bi latînî

6- Hozan û torevanên Kurdistanê perçê 1(tercume)

7- Hozan û torevanên Kurdistanê perçê 2(tercume)

8- Ferheng (Latînî)

9- Kurd. Basîl Nîkîtîn (tercume)

10- Mînoriskî (tercume)

11- Lêkolîna li ser rojhilata navîn

12- Hespên ristevanên Kurdistan

13- Leyla û Mecnûn (tercume)

14- Li ser instîtûta Kurdî li Lênîngrad

15- Ûsiv û Zelîxe (tercume)

16- Ristê hin ristevanan

17- Gotinên Pêşiyan

18- Hesenê Mûsa (çîrok)

19- Nivîsar (Hin nivîsar)

20- Çîroka xortê Îranî (tercume)

21- Dewleta Mahabadê (tercume)

22- Dewleta Eyûbî li Yemenê

23- Çîrokên Kurdî

24- Kêferat li ser Kurdistanê, Xalifîn (tercume)

25- Tarîxa benî Eyûb perçê 1

26- Tarîxa benî Eyûb perçê 2

27- Tarîxa benî Eyûb perçê 3

28- Baqismatê reş-çîrok (tercume)

29-Şûforê kemyona sor

30- Dîwana Cegerxwîn 1927